ram

**ŞIKÊR**

Şengul OGUR

***Weşanên Aram***
Marqeyeke ŞEVDA Basim Yayinê ye

***Dîroka Çapê:***
Nîsan 2012

***Koordînatorê Weşanê:***
Mehmet Emîn TEYMUR

***Rûpelsazî:***
Zafer TUZUN

***Çap û Berg:***
Gün Matbaacılık
Reklam Film Basım Yayın San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sk. No: 23/A
Küçükçekmece İstanbul
**Tel:** 0 (212) 580 63 81

**ISBN:** 978-605-5454-48-7

**Şevda Basım Yayın**
Huzurevleri Mah. Kalem Sok. No: 32 Kat: 3/3
Kayapınar / DİYARBAKIR
**Tel:** 0 (412) 238 30 71

# *ŞIKÊR*

Şengul OGUR

**Aram/Helbest**

**Ji bo bavê min Evdile û diya min Delalê!**

**Noş**

qedehek mirin
ji te re hildidim ey mirin!
noş ji te re mirin
noş!

**Wê demê**

Ji sirûdeke şikestî ya bîra te ya kûr bûm,
di dûrahiyên stêrkên lerzok de
di xwejibîrkirinan de, dema ku bi bîr dihatin
bêdengiya di xwe de kerr bûyî
dema ku dibûne pir,
hemû camidên derveyî min di navbera min û te de
şefê orkestraya qîrînên stranbêjên lal bûm
li dikeke hestiyîn î zîvîn

## Piştre

Ji havîna temenekî dipengizin payiza temenekî
xwe li ba û bageran dipêçin pelên zer î riziyayî
ne bê bîr in jiyîn, bê bîr bîminin jî carinan bîr
piştre, erê piştre welatek serî dide der ji pişt û moranê
çiyayên serî di ezmanan de, wilo hildikişin ber bi Xwedayan ve

hemû çîrokên di bêdengiyê de dîlkirî
wekî ku ji xewna hezar salan hişyar bibin
dil diavêjen qozeqerên jibîrbûyî, bi sed dilan
di kefên destan de mirina kefenkirî
pifî ber bi ronkahiya rojê dibin

**Bêjiyên rûpoşkirî**

Bêjiyên rûpoşkirî li ser can û cesedên me sîsalk in
li erdê dirêjkirî cesedê çelengekî xakê maç dike cara dawîn
lo bêjîno! bêmêjûno!
bikerifin goştên xwe yên dawîn;
ji mêjûyê bi gurmegurm tê qewmê koyî!

## Hemwate ne em

her ez bûm ê ku ji mirinekê ber bi mirinekê ve direvî, bi bêhnefişkî
nizanim ne dildarê revê, ne yê mirinê, ne jî yê riyan bûm
lê her li mirinê, revê û riyan bûm
hemwate ne êdî em
ji me li kîjanî were nihêrîn, hev destnîşan dikin êdî em

## Min Dît Helepçe

min dît;
Helepçeyeke di bêdengiya xwe de kewiyayî bûm ez, li quntarên çiyayên asê
min dît;
di ezmanekî bişîrînên xwe windakirî de bûm ez, di seqema mirinan de bê reng
destên min bê ber bûn êdî, di awirên pêşmergeyekî de lerzok
di şopa stûyê wî yê nîşandayî de, keştiyeke di zeryaya miriyan de noqbûyî bûm ez,

êdî min dît Helepçe!

## Baran dibariya

me agir diqelaşt, li wê taveheyvê bi awirên noqbûyî
wexta ku bajar ji xwe re li hembêzekê digeriya bi giryan
me xwe di siya beybûneke birîndar da derman dikir
baran dibariya û em dimeşiyan dema ku ditewifî ronahî
baran dibariya û em digiriyan dema ku ditewifî ronahî

**Kat**

peyvên ji hev feşkilî me, di seqemekê de
pişta xwe didim kîjan dîwarî hilweşiyayiye
destên min î ber bi ezmên me ve dirêjkirî, kat dane
dikin ku xwe kat bikin hemû katên min

**Wendayî**

Ma ne wendayiyek im!..

W'ezê bar bikim naxwe, lê lê kulê
Ji çîrokekê, ji xewnekê
Weke dilopa ku ji ewrekê bar dike
Bi ser pelê nefelekê de, li min lê lê

## Piştî barbaran

Piştî ku ewên barbar hatin, wan em hînî gelek tiştan kirin
Wekî şewitandinê, girtinê, kuştinê;
Wekî guh û poz û ziman jêkirinê
Dawiya dawîn em hînî zimanê xwe jî kirin
Lê wan tenê nikaribûn me hînî tiştekî bikin:
Hînî serîtewandinê

**Serkeftin**

Ez çawa dizanim ku hûn têk çûne!?
Bibêjim ezbenî, wexta ku keç û xortên gelê min
Wekî ku berê wan ketibe zemawendê, bi kililiyan
zindan û goristan pêşwazî kirin

**Ber-helbest**

Helbesteke di cênîka te de teqandî me ez, ezbenî min baş bixwîne!

**Hêvî**

Hê jî hêvî dikin
Hêvî dikin ku em ê bê hêvî bibin
Hêvî dikin ku em ê hêviya xwe pêk neyînin
Lê ew jî dizanin ku êdî hêvî nakin
Hêvî nakin ku em ê bêhêvî bin
Hêvî nakin ku em ê hêvîya xwe pêk neyînin
Ji bo ku bê hêvî ne, barbar in

## Kêlîk

Carinan kêl in kêlîk dimire
Kel in carinan kêlik kelogirî dibe
Kelek in carinan kêlîk di derya kêlîkan de noq dibin
Hin kêlîk hem kêl hem kel hem kelek in
Nizane ne dimire ne kelogirî dibe ne jî noq dibe!

**Çi bikim Xanî**

Çi bikim Xanî hê jî Xalib e îro li ser me ev Rom
Xirabe ye Kurdistan di destê bûm

## Beytikê dilê min

beytikê dilê min!
destûr nîn e ji firînê re
perwazan nede xwe, tu elind nîn in
ezman nîn in ji per û baskên te re
nexwîne, tu beytikê dilê min!
tu guh ji bo te nîn in!

## Zarokên gelê min

Ey zarokên gelê min î ku li şûna qerenfîlê,
berikên risas di ber guhê wan de dikine wîlewîl!
Heke min hespekî sax mayî dît di vê berbeyaniyê,
de ez ê xwe bera nav zeviyên ji kerbê werimî bidim û biçim
Di şevên ku bêdengiya wê bi dengên teyrên hesinî çirandî de,
hespên xwe bidim çargavan û ber bi rojê ve bidim rê

**Bîrîna bîrkor**

Kilê min kulkirî ye her ku di çavê xwe didim
Li birîneke bîrkor dikulim

**Bi xatirê te**

Wexta ku roj hilat bi xatirê te
Bi xatirê te wexta ku roj çû ava
Wexta ku bê pelê kulîlkê ramûsand bi xatirê te
Bi xatirê te wexta ku çirûsk li avê ket
Wexta ku deng di bêdengiyê de kerr bû bi xatirê te
Bi xatirê te wexta ku şevê şîn danî
Wexta ku rê dirêjî biyanistanan bûn bi xatirê te
Bi xatirê te wexta ku gav ji qerem diketin
Wexta ku hêstirkan xwe li çavan girt bi xatirê te
Bi xatirê te wexta ku bişirîn li çavan veniştin
Wexta ku bihar hat bi xatirê te
Bi xatirê te wexta ku daran pelên xwe weşand
Ji hemû dem û wextan; war û xakan bi xatirê te
Bi xatirê te ey leylana bê wext hat û çûyî

## Zarokên ezmanî

Li bîrê, Oxirekî 13 derbî di oxira ezmanekî çikîsayî de
Benê bafiroka ji dest filitî, di lêgera destekî tilîk sistbûyî de
Ji Qoserekê awirên hilfirayayî,
ji lutkeyên Mêrdînekê awirvedaneke xatirxwestinî
Bi tenê nemayî Oxiro,
li dû te çend pipirîk hilfirîn, min ji bîr kir bihejmêrim
Ev xak comerd e ezmanê mino,
ma tu nabînî zarok çawa ber bi te ve hildipekin?
Hildiperikin yek bi yek ji derencekên ber î risasî
Ber bi şînahiya te ve hêdî hêdî
Ber bi bêsêrûberiya te ve bi peroşî

**Dil a warxweş**

Cihekî ji min re veqetînî tu li keviya dil
Ji bilî goristaneke teng min daneynî dil
Li kêla min: "Rêwiyekî dil a war bû"
Bineqişî tu dil a warxweş

**Helbesta ji rêzika xwe reviyayî**

Kurdistana ku min bi xewneroşkan pêçayî,
ji dara xwe terqiya û firî ezmanên nenas bû!

**Dil-ber-avêtiye**

Di çavên avên havînan de evîn
Firûya di hêlekana kêliyê de kil bû
Lêv lehimîn bi latên sincirî ve lewhe
Lewheyek lal e
Laş aş
Aş nabe êdî bi ti bêjeyan guh ax!
Bi çav de rijiya weke aveke reş spehîtî
Lew roj tefiyaye
Bê mêjû ye mêjî ji mêj ve
Dil!?..
Dil-ber-avêtiye

**Kulîlka fîrmeskhez**

Xwîsiya li rûyê kulîlka lerzok min dizî ji xwe re,
di tarî-gewrika berbeyaniyê de
Li rûyê wê min danî hemû maçên xwe yên gezo.
Doza gulekê kir ji min
Min ew li qelşa dil çand
Ji hingî ve bo wê dirêsim van rêzikên bi hêstir
Her ku dibarin rondikên min ew zîl dide
Şax dide
Berdide rayên xwe li rayên min
Kulîlka fîrmêskhez

**Soz**

Destên xwe bide min îşev bi deyn
Ji demên bihurî deyn bike tu îşev
Bêhna xwe
Beşîşîneke şermok û şimamokî
Awireke tije evîn
Kenekî biharî

Soz!.. Beriya ku bihile roj
Ne ez ê deyndarî te bim
Ne jî tu yê deydarê zemên!

Destên te di dilê xwe de ez ê li te vegerînim
Bêhna te di xwîna xwe de
Beşîşîna te di nav hêstiran de

Awira te!?...Wê ewra min be
Kenê te wê geh zivistana min
Geh jî bihara min be

Lê her duyan jî soz
Beriya ku bihile roj
Di nav rojê de ez ê li te vegerînim

**Ez ê dîsa bêm**

Ez ê dîsa bêm
Di dema hilhatina rojê de
Li destên min baqên nêrgizan
Li çavê min golên peqiyayî
Li guhên min dengê te yî bi kevz
Berî Helepçe û Qamişlokan
Bi Newrozan re ez ê bêm
Ji Cûdiyan ez ê bêm wekî şervanekî serkeftî

**Têgihiştim**

Bê şiyan in gotin, tê gihiştim!
Bê şiyan e dem!
Xwe li şevê dipêçin jiyîn
Li bêdengiyê bîranîn

Di bê de ye hilma te
Awira te, li stêrikeke zenûn dilûse
Hildifirin bêjeyên te ji devê kevirên şil
Carinan bejna te ye lerza kulîlkê, zanî!?

Ewr te dibarînin li nîsanan nazenîn
Kuliyên berfê li mijgulên te dihêwirin
Qirşên bênderên jibîrbûyî navê te dipistînin lê

Ne min got; bê şiyan in gotin, tê gihiştim
Bê şiyan e dem!
Dive hiş bim!
Min divê hiş!..

**Xewndizê**

Bajar jî xwe radestî xewê kir
Dengê dîkan jî nayê vê berbeyaniyê
Stêrka li pencereya min bê deng e weke min
Şewleya şaneşîna şîn xemgîn e
Taritiya odeya min birîn e

Nikarim bibêjim, “were”
Nikarim bibêjim, “were em li ber pêlên newayekê berdin
dema dirinde.”

“Ma ji awirên te kulîlk dîsa dikarin zîl bidin?”
Pirsek e bê kes ev, tu guh nede min!
“Ma li zeviyên simbilên şil em dikarin zarok bin dîsa?”
Tu guh nede min, a min xewnerojkek e lê!
“Ma pirpîrîka rengîn dikare xwe li çeqla darkula min deynê?”
“Ooo to!.. Pirs! Pirs!”, dibêjî tu

Wilo li min nemeyzîne..
Dengê te yê ku min ji biharekê hilçinî
Li giyanê min nereşîne

Va ez çûm
Wekî ku qet nehatibim
Wekî ku te ez nedîtim
Nebihîstibim

Gelo tu baş î?
Dikarî bikenî?
Dikarî bigirî?

….

Dizanî?
Wê baran bibare kêliyeke din
Nizam ez ê çi bikim hingî!
Belkî bibe kûrkûra min
Belkî bibe oreora min
Belkî!?.

**Belkî**

Îro jinek giriyekî gir
Di gewriya giyanê xwe de girêdaye
Dizanîm dê girêk nefilite!

Kilê çavê wê
Ji wê şînê reş e

Ji ewrên giyên dibarin baran
Bi ser wî arê konsotîner de

Dilek im ez, ewqasî reben
Revokê ji çavê jana te
Li min nenihêre, ez qurban
Hevalbenda wî çinarî

Xemla te ji şevê reş e
Biriyên te alayeke tewiyayî
Peyvên ta di malzaroka xwe de mirî
Lê tu megrî
Belkî!..

**Xewa min tê**

Bo te ye ev helbest
Eva ku bi xwînê lê dibe
Li kîjan cemedê,
Kîjan taristanê yî?
Bo te ye roniya çavê'm

Bi her tîpê re ricifek im
Bi her tîpê re bê tilîk
Tarîtir e li min roj
Ku nîvco ma helbest
Bibexşînî lê Gulê

Ji stêrkan diweşî tu
Bêdengiya te ji şevê
Berfa spî Gulê, berfa spî!..
Xwîna sor Gulê, xwîna sor!..

Çira min ditefe Gulê
Ji dûr dengê guran tê
Ez li çiyayekî Serhedê
Xewa min tê lê Gulê
Xewa min!..

**Lê lê gulê**

lê gulê!
lêvên xwe di lêvê min de
ez bimijim jê zindanan
jê zivistanan
zengarên zemanan
û di rojhilatî de gulê
li ser sînga te deynim serî
û bimirim bi mîranî
lê lê gulê!

## *Bila bimîne*

Welat heye
Wekî her şibakeyê bendawer
Û baran hene yên ji axê re biyan
Û kolan gav bi gav goristan
Çawa tê gotin niza'm!
Xurexura tavên winda hene
Di hebanên me de
Di destê me de kulên awirên me

Ma piyên xwas di zeviyên simbilên şil bidim gelo?
Û keziyên xwe berdim li ber bayê?
Ku biçirînim tepê sînga xwe ji hewaran re
Ku maçî bikim Mem û Zînê ji kêlên wan
Û xatiran bixwazim ji Beko
Ji Mîrên Botan...

Helbet helbest e ev
Wê dîl bimîne gotin
Li min negire a dilê min
Belkî rojekê ku zîl dan bihar
Ku xuşiyan çem û robar
Û hilat roja nû..!

**Ax**

dem bûye çem
ez tê de masîyekî bê welat im di zikê segmasî de
ger mirina min jî be, azadiya min li ser ax
va ye ez dimirim
ax!..

## Binihêre

*Kulfiroş'am!*
*Xweliya bi demûş dibare ji heyvê*
*Û em cinûb in*
*Du hezar û çarsed sal in*

## Çîrokek

Siwarê hespê şevê bûm, bê serî
Li çirûska reşika çavê te aliqîn sim
Ji bijî bûn dest
Ji zengûyê pî
Têwerî »bihuşta winda« bûm

Kuliya pêşîn a zivistana min
Ewirî li mijgûlê
Bayê pêşîn ê payiza min
Weşand stêrka min
Beyaniya pêşîn a bihara min
Hilqetand nêrgiza min
Bêrêvariya pêşîn a havîna min
Bû hût û xwar heyva min
Gindirî bi ser dêmê de hêstirek bi giranî
Li ber şapaya wê çû mal li mîratê

**Xatirxwestin**

Ev rê di tu deran dernayê
Ev rê bê veger
Eva ku wekî helbestekê lê dikim
Xatirxwestineke ji xwe û we ye
Li benda min û çi ne hûn?
Bi gotina »bibe«-yê bûyin derewek e!
Helbestvanek jihişketî bû ew hevalino
Nizanibû çi digot
Lê ez!.. Ez dizanim çi dibêjim
Bi gotina »bibe«-yê bûyin derewek e
Lê bi gotina min a »nebe«-yê nebûn rastiyek e
Tekane govanên min ev rêzikên min in.

**Velerzînek**

Gotinan pars dikin em li ziman-bazarên biyan
Loo dilo jaro! Hoo!..
Û tên çandin em wekî dengekî dewixî
Wekî rengekî çilmisî li hûte-çandan
Çîrokeke mînîmal e êdî dîroka me
Ya ji siya Yêzdan dirêjtir
Ji temenê pirpirîkê kintir:
"Tî hatin, tî man û tî çûn"

**Ber bi rojê ve**

Rojeke din diqulibe ji asoyê çavê min
Niza'm ew siwarî, wiha bê serî bi ku ve diçû!
Li pey şopa simê wê hespê bihûrî temen
Ne roj rawestiya ne jî hesp
Ne jî ez bi ser raza siwarî ve bûm

**Helbesta darê**

Qurmekî darê yê hundirqewartî me
Nexapin bi pelên kesk ên li çeqlê min

Dema ku ba li min dide stranek ji min dibile
Nexapin bi vê stranê, ew strana mirinê ye

Ez ê bême birîn bi xîzarekê di demeke nêz de
Û piştre bibim rûpelekî spî li ber destê te
Ji hestê te re bibim helbestgeh ey helbestvan!
Nizam hingî tu yê helbesta min jî binivîsî!?

**Gava ji zemên xeyidînê**

Min mêhtin kerbên kendalên kovî
Di soriya berbanga xeyidî de
Dema ku baz xwe basko dikir
Û xwe fitî ser termê ezmanê xwe yê mermerî dikir

Nikilên wî yên şikestî ne, xameya min
Hibra min xwîna Xwedayên serjêkirî
Li lat-lewheyan dinivîsim ez
Kelamên Xwedayên serhildêr
Ji wê kêliya ku berbang
Di bangdanê de hate serjêkirin

**Gotinên miriyekî**

Cixareyeke qaçax î pêçayî me, di lêvên şevê de
Her ku dibînim heyvê bi xemginî
Giyanekî rayêxistî me, bi parsûyên xwe ve
Li taveheyvê

Ma mirî zindî dibin?
Ji çavê xwe dipirsim
Di erênayê de ye dilê min

Meyzê, dibêje, dengek,
Em ê bînêriyê li mirina xwe jî bikin
Em ê bibînin ku mirî jî dimirin

**Gotinên xwîn di wan geriyayî**

Hûn ê bi bêjeyên min têhna xwe bişkînin
Loma min xwîna xwe bera qurmên wan dabû
Û îro xwîna min qediya
Herikî cihok bi cihok
Ma tilîkên hê sor nebûne bi xwîna min?!

**Bêdengiya gotinên min**

Guh nedin gotinên min;
Siya termê xwe ne ew
Ma di çavê te re naçin hestiyên zimanê wan en şikestî!?

Hemû gotinên min xwe noqî bêdengiyê kiribûn
Ma tu çi hişsivik î
Qey te nexwendiye; ji keştiya Nûh tu tişt nefilitî
Ma tu dizanî sedema şîna Cûdiyê çi ye!?
Û bo çi kûr dinale Dîcle!?

**Ev ba kujer e**

Ev ba tawanbar e, bi qasî dilê min î şûm
Ev pelên mêwê yên ku bi zerikê ketine
Ev darhejîra ku hejîrên xwe dinefilîne
Û ew kulîlka darbehîvê…
Ya xwe li min kirine yek û
Stûyê min ji şûrê xwe ên ko re hesan hilbijartine

Hahakê sû dikin şûrê xwe
Hahakê sîqal dikin bi xwîna min
Di berêvariya berpayizekê tawanbar de

**Lêgerîn**

Tebaxê dikarîbû şax jî vede
Ji latên tî avê dikarîbû bizê
Strîyan dikarîbûn gul vedin
Û me dikarî xwe tevî çîrokekê bikin

Çerx bû geometriya ezmên
Xweş û xweşiktî ji nêrgizê çûn
Û Newroz di dûxana agirê xwe de fetisî

Niha li kavilên vî bajarî, vî welatî
Kavilê giyanekî li kavilê cestê xwe digere

## Em biçin

Pêjna payizê tê li kûçeyên min ên kavil
Toza li biniya hêtê jibîrbûyî bi ber bê dikeve
Û qirşikên bê nasname xwe li mijgulên min digirin
Ez gavên xwe di firazeyekê de winda dikim

Ev roja han nikare van têlên direhî bihelîne
Ev çûkên han ji ezmanê xwe xeyidî,
Wekî dînan niklên xwe di jehra mêr didin

Em biçin, di nav strîyên zer î hişk re
Di nav toz û xûbarê,
Ba û babilîsokê re

**Sîmir mir**

Ji min helbestan dixwazî tu
Dibêjim; mirî me ez, tê nagihijî dil?
Ne meyê, şevê di piyalê ke
Bila kemanjenek li têlên dilê min bide, dibêjim
Ma çima serwext nabî,dil!?

Dizanî!?..Ferhenga min bi firê ket ji lîsa zimanê min
Ji min sil bû îşev
Min qet neda dû
Bû Sîmir, dizanî!?..
Sîmir mir!..

**Şahmaran**

Ez te ji lalitiya te hez dikim şevê
Lêvên min ên şahmaranekî ne
Çi kevirê ku lalitiya te li ser in, radimûsim
Vediguherin zimrûd û yaqutan
Dema ku di xewê re diçin çav
Çavên min oqyanos in hingî
Biaxive, metirse li biniyên min
Li vir bawermend in hemî zixur

**Şopa min şûv e**

Ne bayê ku pora te ta bi ta li ba dike me, ez
Ne jî kulîlka li ber guhê te ji jiyanê re çav dişikîne
Min keştiya xwe noqî deryaya şevê kir li taveheyvê

Ew ê ji tilîkên min hibir biwerive
Tawiz wê bi niklên xwe li cama min
Nivîsên li parşomenên winda binivîsîne
Û ez ê ji wê camê xwe têwerî çîrokê bikim

Şopa min şûv e!..

**Xwekuştina helbestê**

Helbestê xwe kuşt
Dema ku çikiya çav
di mirineke çikîsayî de
kenek devqîç ma bi inyat
ku tê de şeniqandina heyinê nîgarkirî

û herî dawî ji çavê min
nizanim bibêjim!?
bila bimîne!..

helbet wê kevir neaxiviyana
qewl bû bêdengî
ku guh bi dil ve hebûna
ba bû senfonî
bihar û zivistan xwişk û bira bûn

dizanim ew mil
bi çar çavan li darbestê ne
û gav revokê ji goristanê
lê xan e ev, bê eman

Kî ye kujer?
min got û dibêjim:
xewn bê xewn bin heger
û ku roj ji şevê bi heml
daxwaz çarmîx be û
bê bawerî be Îsayê min
Xwedê jî têra xwe xayin û
cihû jî bi qasî min bêcih
ger ku nebêjim û nabêjim: Yahuda
lewma baş dizanim xezeba wê
(wê, dibêjim lewma baş dizanim ku ne nêr e ew)
helbest xwe dikuje hîna bi ciwanî
nimêj nabe, dizanim li ser vî meytî
"ji devê şeytên pekiyabû
dojeh jê re doşek e..!"

sahneya yekem: mirî tê recimkirin
sahneya duyem: mêjû ji mêjî tê derînîn
ji hestû dahatû
...!
"çi ma?"
sîng di sîng de bikutin
bav di çav de
yar di ar de
xweliya giyan li her aliyan li ba bikin
da ji çavan re bibe ibret

de hişyar bibe xewa bê xewn
helbestê xwe kuşt
di mirineke çikisayî de

**Ger tu rojekê**

Di dengê çivîkên ku berbang dixwendin de
Min tu nixumandî
Bi bêhnên beybûnên biharî
Û xwêdana zarokên şad…

Ji jibîrkirin û jibîrbûyinan têm
Ewqasî rastgo
Ewqasî zelal
Dema ku xwe noqî zikê asoya xama kir
Heyva perengîn -wilo bêdeng-
Min ji darkulên xwe
Kulîlk firidandin
Bi ser xewnên te yên bihuştî
Wext e!..
Çiya di hênikahiya xewa berbeyaniyê de ne
Kêliyek din ez ê serê xwe deynim
Emanet; ji bîr neke; min tu bexişandiyî
Bi qasî ku min ji te hez kiriye
Ewqasî ji dil

**Axirê**

Va dîsa di şevên porê te de
di xewê ve diçin tilîkên min
min ê li ser lêva te danîbûya
peykera hezkirinê
lê olperesteke temam bûyî tu
min ê çawa bizanibûya ku
wê Xweda bibûya Beko!
helbet min xwe nekuşt
lê min di xwe de kuşt her tişt
dibînî?.. çi goristaneke bê ser û ber im!
a ku argûşkê min bel dike
Agirî ne, Cûdî ne, Gebar in
ev cotşopên li qiraxên çavê min
şopên Dîcle û Ferêt ên çikiyayîne
çavê min roja tefiyayî

me çawa dest pê kiribû?
axir… di hênikahiya şeva porê te
ên simbilîn de di xewê ve çûm
dema ku di gewriya min de ma dasî

**Kund dixwîne li kavilen helbestê**

Di wê kere-siha mezela kerpîçî de
Ya ku awirên min dirêsa, hilawêsitiye
Bi hemû bûjenên gezgezokî ve

Di nav hestên min dide ev bêdengiya pirbêj
Da ku xwe têwerî nav kurm û kêzên biharê bidim
Bawerzîna aramkuj ya ku ji pêşedemekê
Min haydar dike bi gavên xwe ên xumxumî
Dagir dike şaneyên min mîna dagirkerên Romê

Hê ji hev dernaxim ez heyv û rojê
Hê ji hev dernaxim ez xwe ji xwezayê
Şewleyên dûr pir in di navbera min û Xwedê de
Ku stêrk dixuricin ji ezmên dimirim hê
Û ku roj diçe ava sil im ez jê

Bi mûyên mijgûlên xwe dikşînim beyaniyê
Zimanê min berzûrî dike li zeraqê
Û destên min ji gewre-xewnên min
Dirêjî zeviyên nêrgizan dibin bi lerz
Hetanî bi gwîzekê herî me ez
Hetanî bîbîkên çavên xwe şil û baran im
Bûka baranê me geh
Geh jî zarokê li pişta çiyayê qozeqerê
Ez ê bibûma keç hingî, keç jî dê bibûna kur!
Ax! Min bi berûyan re çal kirin nîgaşên xwe jî
Berûyan zîl dan lê nîgaş çilmisîn

Min nezanî ku zeman marek bû
Ku ji nav piyên min xûşiya
Min nezanî  ya ku min ji kulîlka mijmijokê dimijî
Xwîna min bû li  tarî-şevê

Ez ê xewn û xewn biçûna û
Min ê xwe bigihandaya dilê Xwedê
Min ê tilîka xwe di çav re bikira
Û ku ji xewê hişyar bibûma
Wê jiyan veguheriyaa bihuştê

Xwedê fen bi min kir gelî çûkan
Xwedê fen bi min kir gelî kulîlkan
Xwedê fen bi min kir gelî pirpirîkan
Ev e giliya min, hûn pê bigihînin

*Şerê di navbera zar û Xweda de dadmend nîn e!*
*Şerê di navbera zar û Xweda de dadmend nîn e!*

Min di geliyekî de hişt qîrîna xwe
Da ku di jinûvevejînê de govaniyê li min bike

***

Ez li ser kursiya xwe yaê plastîkî
Bi çavên xwe ên şeqiz dinihêrim
Giyanên bireseran bi firê dikevin yek bi yek
Hin ji wan lorîkan diavêjin ser hinan
Pela dawî ya mêwê ji çeqlê xwe dibe
Û ew jî davêje ser xwe
Cerdonekî jirêketî bi lez xwe di ser kevirên parkeyê re diavêje
Pisîka çavbirçî çavên xwe li mişkekê digerîne
Û kûçikek di derengiya şevê de bê serî ji tiştekî direve

Zilamê li serê kuçeyê xwe ji zilmekê re amade dike
Ez hê jî li ser kursiya xwe ya plastîkî rûniştî
Guhdariyê li xuşexuşa çemê şêt dikim
Hê jî di nav hestên min dide ev bêdengiya pirbêj
Da ku xwe têwerî nav kêz û kurmên biharê bidim
Hişê min hişkere dike bi zimanê xwe ê hişk:
"Di heyama hov de yî bêhişo!
Hemû hêviyên te bi heyvê re bûne xwelî
Êdî hînî ezmanê bê heyv bibe!"

Dibînim ku keçik bi kelecanekê
Sîqal dike camên şibakayê bi zendikên tazî
Awirên xwe di latan de dikute bêdeng
Min di guhê wê de pistand:
"Min jî, wekî ku bizmarekî zingarî bim
Di çavê jiyanê de bikute!"
Wê ne ez dîtim ne jî seh kirim
Û min bi kerbekê kuşkuşand ji qelûnê

***

Ey "kêlî" ya mîna dafekê
Di zeviyên zemên de li ber min vedayî!
Sond, ez ê nêhêlim tu li zimanê min zîl bide
Ku xwe di çavê min re bikî jî tu
Ez ê destûr nedim ku guhên min
Li strana te guhdar bin û
Ev dilê min î ku dil bavêje ser te
Ez ê wî ji xwe re dil nebînim
Û gavên min î li dû gavên te
Ez ê ji xwe re gav nebînim

***

Şeqeşeqa diranên min
Ji hincav dikevim
Qeşaya hinavê dilê min nahelîne
Banga ku ji minareyê belav dibe û
Dagir dike bêdengiya pîrozmend

Dengê zarokekî dizingê li zinarekî:
*Zeryayan bînin ji min re*
*Zeryayan bînin  ji min re*
*Tî ne reşikên çavên min*
*Lêvên min beyaban*

Bi mişemişa baranekê re kerr dibe deng
Û tevî mijekê dibe zarok

Zimanê xwe di bîrînên min dide
Siya rimiya çiraya min ya li hêt bi cezbê ketî
Dengê ribabeke ku ber bi mirinê ve diçe
Bi bayê felekê re xwe li dilê min î zarok digire
Û şev di dilê min de bi jana zayînê dikeve

Qewlên xwe ji bîr dikin dîk
Çiya xwe didin ber hev

***

Pela zer ya mêwê li şaneşîna xembar
Bi govenda mirinê ketiye
Perdeyên mezela kerpiçî
Li jiyanê hatine kişandin
Ferek ji şimika zer bê pî maye
Doza piyekî dike bi dengekî qerisî
Li ber deriyê kesk î mezin
Li kabên xwe dixin hin jin
Hin jê xweliyê bi serê xwe de diweşînin
Hin jê serê xwe dane ber kulmanü

***

Ax! Min dive razêm li vê sir û seqemê
Cesta min xweziya xwe bi kevirên cemidî tîne
Xweziya min mîna kevirekî di gewriya min de diçike
Bi çavên min ve dikişin zembelîlk
Zimanê min nagere, devekî bi kelem im êdî
Hê gotinên min hebûn ku doza siyekê dikirin
Bêjeyên min hebûn di bîra min de
Ku wê bimijîna mija mêjûyê

Ax destê min î zarok!
Dûr e ezman, dûr in stêrik
Dûr e şeva lê wenda
Hewtikên ku lêvên min dizîbûn ji xwe re
Herifîn bi kulmeke bi himet ya heyamê re
Riyên ku ez ji rê birim, li min bûn ziha
Û berbangên min î xama
Radestî destên bi qirêj bûn hezaran caran
Heyva ku min dil hebû dil bidimê
Hêviyeke ji xweliyan bû

Ku bi mijgulên min ve zeliqîn

Gavên min bi ser gavên min ve nabin êdî
Di fitloneka kuçe-tariyekê de bê şop mam
Mam
Mam
Û mam!..
Ne çûkan, ne kulîlkan
Ne jî pirpirîkan tu mizgînî dan
Û şevê li reşika çavê min kon veda
Û şevê li reşika çavê min kon veda

***

Berêvariyek ji zivistana riziyayî
Ji camên pencereya derizî
Dilê beytika bi lerzê ketî
Ji min re zemên diwîçwiçîne
Ma ez ji we re bibêjim tîp û
Ayetên ku wê bi niklên xwe
Li cama min lê kirî!?

Diwîzwîzîne zeman
Divirvirin sal ji salnameyan
Hijmar diweşin ji çavên min
Her yek bi dilqê mar
Ji kefa destê min dişemitin
Li zimanê min şûna qîlên wan
Jehr dipijiqînin ser-tilîkên min
Jehr dipijiqînin ser-tilîkên min

***

Herifîn hêtê mezela kerpîçî
Bi ser hemû bûjenên gezgozekî ve
Ne çûk filitîn jê, ne kulîlk
Ne jî pirpirîk
Kund dixwîne li kavilê helbestê
Di berbeyaniyê de
Ji mizgeftê belav dibe deng
Dagir dike pîrozmendiya bêdengiyê
Dengvedaneke vedayî dimîne:
Zeryayan bînin ji min re
Zeryayan bînin  ji min re
Tî ne reşikên çavên min
Lêvên min beyaban

**Albuma wêneyên şikestî**

1.
Niha li der ve zarokek
Di cênîka wî de
Lûleya çardeh derb

(Teq..!
Teq teq..!
Teq teq teq..!)

Ji helbestê xwîn dihere
Ji helbestê ..!

(Kûûûûûrrrrr..!
..!Kûûûûûrrrrr..!)

2.
Serekî biçûk
Di biniya piyekî mezin de
Hewl dide serê xwe rake
Di tariya bê his û kurên de

3.
Li navmilên keçika biçûk
Jopên reş direşin
Dema li wir ket
Kesî ranekir

4.
Mij û moran e
Dixwazim derkevim
Her der girtî ne

5.
Şibakeya min li min xayîn e
Min îro ew şikand
Berî ku ew bişkînin

6.
Ezmanê min bê xwedî ye
min biniya erdê hilbijart
tu tiştî nepirsin
carinan bêdengî ye gotin

7.
Ji biniya latekî qerisî
Kulîlkekê serî da der
Marekî ew daqurtand
Piştguhe xweştiviyê sêwî ma

8.
Hine xwîn bû
Bûkanî ar
Xêlî serhildan
Qad goristan
Şabaşa!
Lê zava?!

9.
Helbestvanek bi çolan ketiye
Li helbestê digere

10.
Helbestek ji rûpela xwe teriqiye
Li helbestvanê xwe digere

11.
Berê zindanan fireh bûne
Ji her şibakeyekê
Çav bi tirs dirêjî rojê dibin

12.
Jinikek pêçeka xwe direvîne
Ji dergûşê
Dibejê, “tu sûcê wê nîn e”

13.
Dema ku roj diçû ava
Li ser têlên direhî
Çûkan govend  girtibûn
Hinekan ji wan zingara lûleya tangê dinikilandin

14.
Bajar xîkîxalî bû
Rîspiyek ji rê derketî
Nifir li Yezdan dikir
Xwelî bi serê xwe de dikir

15.
Kemanjenek li serê zinarekî
Bi newayan Yezdan didarizand

16.
Li ser wêneyên dawî
Wiha nivîsîbû:
Piştî her tiştî gotin hebû
Gotin awêne bû
Û awêne şikestibû

**Lalêş**

Lêvên  xwe di lêvên lalitiya şeva min bide
li lalitiya şeva min bibe çira

Gotinên ji zemên û zinêr hilkirîne ev
Xwêkirî û daxdayî
Bi zembelîlkên hezaran salan ve xemilî

Çiya ne çav
Guh şikeft
Û dev...
Dev bi dirî û kulîlk in

Diteqin bêdeng bêdeng di bêdengiya kerkir de
Her tîp
Her bêje bijartî
Tije xem
Tije evîn û bêrî
Û bi rim û alav û pêtî

Bigirî tu ey lêvên bi bêrî
Bigirî…
Ev zevî wiha spî
Deqên sor in xwînî
Bê xwedî
Sêwî

Li pişt mijgulan mij
Li pişt mijê
Kevirekî reş î şil
Dengekî tir û tîr
Refên qeqlîbazên firarî

Ev newa
Wiha bi giranî
Ji henasa Yêzdan hatine dizîn
Ev raz ji wextê razanê
Hişyar hatine zeftkirin
Li hêviya lêvên te betilî
Lalitiya şeva min
Bê çira

Bi zeviya spî de girt tarîtî
Hatin xwar dirabe
Kişiyan perde li şibakeyan
Çûk pepûk
Dar bêdar
Roj xûz
Wekî kalekî
Bi xwe re bir ronahî
Pişt wî çiyayî

Lêvên min rijî
Tijî hest û hestî
Û mêjî
Li zeviya spî
Deqên sor in xwînî
Bê xwedî
Sewî

Li tehtê bext im bê rext û text
Deng li reng, reng li lêv hatin kutîn
Quncir û zîwan hilbûn
Nîgar bûn zîv û zêr li lalitî
Yaqût û zimrud li şev

Lêvên xwe di lêvên lalitiya şeva min bide
Li lalitiya şeva min bibe çira

Melekî Tawiz im ez
Di niklê min tîpên genimî
Li ser dara jînê
Dinivîsim
Dixwînim
Her berbang
Li wî çermê guhehkar
Vediguherim ez ji Tawiz
Ber bi Ahûrabûnê

Tu ey dengê min!
Şev im ez bi êş
Lal im ez bi al
Lêv im ez lal
Lalêş im

Lêvên xwe di lêvên lalitiya şeva min bide
Li lalitiya şeva min bibe çira

## Hêviya min

Bizrên jiyanê, ên li vê zeviyê
Wê hêşin bibin li dahatûyekê
Gîsinê min zeman, cotkarê min dil
De biajo dilo!Tu biajo!..

Da bizelile zeraq û zerya
Jê ve bixuye bihuşta winda
Û vemire arê dojeha Xweda
De biajo dilo!Tu biajo!..

Ji bêrmên min biçîne tu gewr-ewran
Ji reşika çavên min tu lerza stêrkan
Ji dilê min tu hemî cure kulîlkan
De biajo dilo!Tu biajo!..

Min şev çandin lê; yên havînan
Û çirayên şevên winda, tevî çîrokan
Berbangên sor, ji çar kîşweran
De biajo dilo! Tu biajo!..

Aliyek min sosin aliyek min beybûn
Dilê min êtûn jii nîvekê vêketî
Aliyekî min şev e, aliyekî min roj
De biajo dilo! Tu biajo!.

**Guhên me**

Guhên me ji jinên xwe re kirin xelat
Û wan jî çawa jî bi guhê xwe ve kirin
Bi şanazî!

**Saqî**

Saqî, comerdiya te ji cankuştina me ye
Zahf in em
Xelas nabin
Tu dagire berdaxê
Ev berdaxa çendan e?!

## Zagona zikmakî

Belav ke, libên tizbiyên ku
tim li te bûn bela
ji sed û yek bavê tirsê bê minet be
veke, devê birînên xwe yên bi dirî
bi derba tivinga kurmancî
berde, tîpên berî yek bi yek
ji lûleya dirêj: bîranînên zingarî, bê tirs
bizingîne zinaran bi zimanê zemanê xwe
bi zagona zikmakî